

RAPORA TESPÎTÊ YA 2022YAN A DER BARÊ BINPÊKIRINÊN MAFAN ÊN LI GIRTÎGEHA ÎMRALIYÊ Û ŞERT Û MERCÊN GIRTÎGEHA ÎMRALIYÊ

I. DESTPÊK

1. Girtîgeha Îmralityê ya Tîpa Fyê, girtîgeheke giravê ya yekkesî ye ku di Sibata 1999'an de bi neçalakkirina hiqûqa navxweyî û hiqûqa navneteweyî ji bo muwekîlê me birêz Abdullah Ocalan hatiye avakirin. Ji wê rojê heya niha bi statu û pêkanîneke xisûsî tê birêvebirin. Muwekîlên me yên ku li vir tîn girtin; birêz **Abdullah Ocalan** 24 sal in, birêz **Hamîlî Yildirim**, birêz **Omer Hayrî Konar** û birêz **Veysî Aktaş** jî 8 sal in di rejîma înfaza girankirî de ku em jê re dibêjin "Pergala Tecrîdê ya Îmralityê", di şert û mercên tecrîdeke awarte de tîn girtin.

2. Girtîgeha Giravê ya Îmralityê, ji roja ku hatiye avakirin heya niha, bûye cihekî ku maf û azadiyên bingehîn bi awayekî sistematîk lê tîn bînpêkirin. Di rewşa heyî de mafên hevdîtina bi parêzeran, mafên hevdîtina bi malbatê û mafên bi rêya telefon, faks, name û hwd. û pêwendîdanîna bi derve ya muwekîlên me ku bi destûra bingehîn, peymanên navneteweyî û qanûnan hatine mîsogerkirin, bi temamî jî holê hatine rakirin.

3. Ji 25'ê Adara 2021ê heya niha, tevî hemû hewldanan jî bi tu awayî **XEBER jî muwekîlên me NEHATIYE WERGIRTIN**. Lewma di sala 2022yan de der barê tenduristî, şert û mercên girtîgehê, rewşa hiqûqî û tiştên din ên bi vî rengî de yên birêz Ocalan û muwekîlên me yên din, tu agahî bi dest neketine. Ev yek kiriye ku fikar gelekî zêde bibin. Rewşa xeberegirtinê ku hê jî didome, 22 meh li dû xwe hiştin.

II. BÊPÊWENDIYEKE MUTLEQ Û XEBERNEGIRTIN

4. Birêz Abudllah Ocalan; jî 15ê Sibata 1999an ve di girtîgeha giravê ya Îmralityê de, di hucreyê yekkesî de tê girtin. Heya deh salên destpêkê, tenê ew li vê girtîgeha giravê bû. Ji meha Mijdara 2009an ve li vê girtîgehê hin hurreyên din hatin çêkirin û pênc girtiyên din jî anîn vir. Lê dîsa jî birêz Ocalan di nava hefteyê de rojê 23 saetan û di dawiya hefteyê de jî 24 saetan bi tena serê xwe di hucreyê de tê girtin.

Heya sala 2011an mafê hevdîtina bi parêzeran ê birêz Ocalan hefteyê rojekê û bi saetekê hatibû sînordarkirin; lê bikaranîna van mafên sînorkirî bi hincetên wekî "rewşa hewayê" û "keşfî xirabe ye" tim tîn astengkirin. Ji 27ê Tîrmeha 2011an heya niha, tenê di navbera Gulan-Tebaxa 2019an de 5 caran hevdîtinên bi parêzeran re çêbûn. Hevdîtina dawî ya van hevdîtinan jî di 7ê Tebaxa 2019an de hat kirin.

Ji sala 2014an heya niha birêz Ocalan tenê karibûye 5 caran hevdîtinê bi malbata xwe re bike. Hevdîtina rûbirû ya dawî ya bi malbatê re, di 3yê Adara 2020an de bi birayê xwe re kir. Di 24 salên borî de tenê du caran (27ê Nîsana 2020an û 25ê Adara 2021ê) hevdîtina bi rêya telefonê hat kirin. Hevdîtina bi rêya telefonê ya dawî di 25ê Adara 2021ê de di demeke pir kurt de di nivî de hat qutkirin û paşê hevdîtin dewam nekir. Ji wê rojê heya niha tu xeber jê nayê girtin.

5. Birêz Hamîlî Yildirim; jî 29ê Adara 2015an, ji roja ku ew anîne vir, tenê carekê jî nehatiye hiştin ku hevdîtinê bi parêzerên xwe re bike. Di 8 salan de tenê du caran hevdîtin bi malbata xwe re kiriye. Hevdîtina rûbirû ya dawî ya pê re hat kirin, di 12ê Tebaxa 2019an de, hevdîtina

bi malbatê re ye. Bi malbata xwe re tenê du caran (27ê Nîsana 2020an û 25ê Adara 2021ê) bi telefonê axiviye. Ji 25ê Adara 2021ê ve tu xeber ji wî nayê wergirtin.

6. Birêz Omer Hayrî Konar; ji 16-17ê Adara 2015an, ji roja ku ew anîne girtîgeha giravê ya Îmraliyê heya niha, tenê carekê jî nehatiye hiştin ku hevdîtîna bi parêzerên xwe re bike. Di 8 salan de tenê 3 caran hevdîtîna bi malbatê re kiriye. Hevdîtîna rûbirû ya dawî ya pê re hat kirin, di 3yê Adara 2020î de, hevdîtîna bi malbatê re ye. Ji roja ku ew anîne girtîgeha giravê ya Îmraliyê heya niha, tenê di 27ê Nîsana 2020î de, bi hinceta pandemiye bi rêya telefonê pêwendî bi malbata xwe re daniye. Hevdîtîna bi rêya telefonê ya di 25ê Adara 2021ê de jî, bi hinceta ku şert û mercên li girtîgehê protetso kiriye ji aliyê dozgeriyê ve ji malbata wî re hatiye gotin. Ji 27ê Nîsana 2020î ve tu xeber jê nayê girtin.

7. Birêz Veysî Aktaş; ji 16-17ê Adara 2015an, ji roja ku ew anîne girtîgeha giravê ya Îmraliyê, tenê carekê destûr hatiye danîn ku hevdîtîna bi parêzerên xwe re bike. Di 8 salan de tenê 3 caran hevdîtîna bi malbata xwe re kiriye. Hevdîtîna rûbirû ya dawî ya, di 3yê Adara 2020î de hevdîtîna bi malbatê re ye. Ji roja ku ew anîne girtîgeha giravê ya Îmraliyê heya niha, di 27ê Nîsana 2020î de, bi hinceta pandemiye destûr hatiye danîn bi telefonê pêwendiyê bi malbata xwe re deyne. Hevdîtîna bi rêya telefonê ya di 25ê Adara 2021ê de jî, bi hinceta ku şert û mercên li girtîgehê protetso kiriye ji aliyê dozgeriyê ve ji malbata wî re hatiye gotin. Ji 27ê Nîsana 2020î ve tu xeber jê nayê girtin.

8. Rewşa muwekîlan ku li jor hatiye xulasekirin, di rapora 5ê Tebaxa 2020î ya CPTYê de, wekî rewşa xebernegirtinê (p. 48 û 49) “Incommunicado” hatiye pênasekirin. Di raporê de hatiye diyarkirin ku ev yek nayê qebûlkirin û hatiye pêşniyazkirin ku dawî li vê rewşê bê. Têgeha “Incommunicado”, awayê bêpewendiya mutleq pênase dike ku girtî bi tu awayî nikare pêwendiyê bi derve re deyne.

Lê belê çendî ev qas wext derbas bûye û her hefte bi awayekî rêkûpêk ji bo hevdîtîna bi malbatê û parêzeran re serlêdanên kirin jî, rewşa xebernegirtinê ya “Incommunicado”yê di sala 2022yan de bênavber hatiye domandin. Mesela, ji 25ê Adara 2021ê, ji roja ku pêwendiyê bi muwekîlên me re hatiye qutkirin heya niha; 238 serlêdanên parêzeran û 79 serlêdanên malbat-wasiyan nehatine bersivandin û di vê pêvajoyê de tu name, telgraf an jî faks ji muwekîlan nehatiye û tu hevdîtîneke bi rêya telefonê pêk nehatiye.

9. Mafê hevdîtîna bi telefonê ya muwekîlan ku 6 mehan bi biryarên bi dîroka 18ê Cotmeha 2021ê, 30yê Adara 2022yan, 9ê Gulana 2022yan û 9ê Hezîrana 2022yan ên Desteya Rêveberî û Çavdêriyê ya Girtîgeha Îmralî ya Tîpa F’yê hatin sînordarkirin. Ev yek piştî ku serî li saziyên navneteweyî hatiye danîn, hat hîn kirin. Ev biryarên sînordarkirinê yê navborî, teblîxî parêzeran nehatine kirin û bi dizîka hatine birêvebirin. Tê fêmkirin ku bi van biryarên fabrikasyonê û şeş mehan carekê bi awayekî perîyodîk tîna dayîn, mafê hevdîtîna yê bi rêya telefonê yê muwekîlan tê sînordarkirin.

Her wiha gelek nameyên ku di nava salê de bi awayekî rêkûpêk ji muwekîlan re hatine şandin jî nehatine berisvandin. Nayê zanîn ku bê ka ev name gihîştine muxatabê xwe yan na û ji wan jî tu name, telgraf an jî faks negihîştine me.

Li gel van, ji ber ku qedexekirina serdanên malbat-parêzeran bi awayekî fiilî û derhiqûqî bi salan bi awayekî sistematîk û bênavber didomin, di sala 2022yan de hevdîtînek jî bi malbat û parêzeran re nehatiye kirin. Lewma sala 2022yan bi temamî bûye sala bêpewendî û

xebernegirtineke mutleq.

III. SERLÊDANÊN HATINE KIRIN Û BIRYARÊN QEDEXEKIRÎ YÊN DIJHIQÛQÎ YÊN VEŞARÎ

10. Di xala 59an a qanûna hejmara 5275an de hatiye destnîşankirin ku girtî dikarin di saetên mesaiyê de hevdîtîne bi parêzerên xwe re bikin. Yanî hefteyê pênc rojan mafê wan ê hevdîtina bi parêzeran re heye. Her wiha li gor xala 25an a heman qanûnê jî, hatiye diyarkirin ku girtiyên di çarçoveya înfaza muebada girankirî de jî, 15 rojan carekê dikarin hevdîtîne bi malbata xwe re bikin.

Di vê çarçoveyê de, wekî berê di sala 2022yan de jî ferdên malbatê û parêzer ji bo hevdîtîne bi birêz Ocalan û muwekîlên din re bikin, bi awayekî rêkûpêk bi nivîskî serî li Serdozgeriya Komarê ya Bûrsayê dan ku ev serdozgerî ji Girtîgeha Giravê ya Îmralityê berpirsiyar e. Heman serlêdan bi rêya dozgeriyê bi rêkûpêk li Îdareya Girtîgeha Îmralityê jî hatine kirin. Lê belê di seranserê 2022yan de, **49 serlêdanên ji bo hevdîtina malbatê yên li her du saziyan** hatine kirin jî, nehatin bersivandin û tu hevdîtînen rûbirû jî yên malbatê nehatine kirin. Serlêdanên ji bo rojên cejnên fermî jî ku bi taybetî hatine kirin, bi erênî nehatine bersivandin. Di seranserê salê de parêzeran jî ji bo hevdîtîne **98 caran** serî li van her du saziyan dane, lê serlêdanên wan jî bê bersiv hatine hiştin û tu hevdîtineke parêzeran çenebûye. Li gel van, serlêdanên wasiyê birêz Ocalan (49 serlêdan) jî ku her hefte serî li Serdozgeriya Komarê ya Bûrsayê û Îdareya Girtîgeha Îmralityê daye, bi temamî bê bersiv hatine hiştin.

11. Daxwazên muwekîlan ên ji bo hevdîtina bi malbat û wasiyan re ji sala 2018an ve bi awayekî sistematîk ji aliyê Desteya Dîsîplîne ya Midûriyeta Saziya Înfazê ya Ceza ya Girtîgeha Îmralityê ya Tîpa Fyê bi hinceta biryarên ceza yên dîsîplên yên “3 mehan bêparkirina ji hevdîtina bi serdêran re” tên astengkirin. Di sala 2022yan de jî serdanên malbat û wasiyan ji aliyê Serokatiya Desteya Dîsîplîne ya Girtîgeha Îmralityê ve bênavber 3 mehan carekê bi hinceta cezayên dîsîplîne di **3yê Sibata 2022yan, 31ê Gulana 2022yan, 9ê Îlona 2022yan û Kanûna 2022yan** hatine astengkirin.

Xala 43yan a qanûna bi hejmara 5275an cezayê bêparkirina ji hevdîtina bi serdêran re di xwe de dihevine. Di benda 3yan a heman qanûnê de wiha tê gotin, “*Di hevdîtinan de yên bi merciyan fermî û erkdar û bi parêzer û nûnerên qanûnî re, hukmê vê xalê nayên pêkanîn.*” Lê dîsa jî serdana wasî ku nûnerê qanûnî ye, bi hinceta cezayê dîsîplîne tê astengkirin.

12. Serokatiya Desteya Dîsîplîne ya Girtîgeha Îmralityê bi van cezayên dîsîplîne yên navborî, bêyî haya parêzeran jê hebe bi veşarî lêpîrsîn dane destpêkirin û cezayên dîsîplîne tenê teblîxî muwekîlan hatiye kirin ku pêwendiya wan bi temamî bi derve re hatiye qutkirin. Piştî ku dema îtirazê derbas bûye pêvajoya teqezkirina van cezayan hatiye temamkirin. Ji ber ku çûna parêzeran a Girtîgeha Îmralityê û hevdîtina wan a bi muwekîlan re bi temamî hatiye astengkirin, parêzer piştî ku ev cezayên dîsîplîne hatine pêkanîn, bi van cezayan hesiyane. Ji ber ku ev pêkanîn bûye pêkanînine sistematîk, me sê mehan carekê serî li Serdozgeriya Komarê ya Bûrsayê, Midûriyeta Saziya Înfazê ya Ceza ya Îmralityê û Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê daye. Li gor vê pêşî divê hevdîtina bi malbatê re bê kirin. Ger hevdîtîna nehatine kirin jî, me daxwazname dane ku ger lêpîrsîneke dîsîplîne hebe divê qeyda me ya UYAPê bê çêkirin, mînaka dosyeyê ku biryar û hincet tê de ne bê dayîn da ku wext di ser dema îtirazê re derbas nebe. Lê hemû daxwaz û îtirazên me, bi awayekî derqanûnî ji aliyê Dadgeriya Înfazê ve hatine redkirin û îtirazên me yên ji bo biryarên Dadgeriya Înfazê jî ji aliyê Dadgeha Cezayê

Giran a Bûrsayê ve bêyî hincet, bi tiştên razber û giştî hatine redkirin.

Çendî parêzer li korîdoreke hiqûqê ya korkirî li hemberî cezayên dîsîplînê yê fabrikasyonî îtiraz dikin jî, lê her tim xwegihandina wan a van dosyeyan ji aliyê Dadgeriya Înfazê ve tê astengkirin.

Axirê tevî hemû daxwaz û îtirazan jî, dosyeyên dîsîplînê radestî parêzeran nehatine kirin, qeydên UYAPê nehatine çêkirin, biryar û cezayên der barê muwekilan de ji parêzeran hatine veşartin û bi awayekî qorsanî hatine teqezkirin û alîkariya hiqûqî bi biryareke hevpar a îdare û darazê hatiye astengkirin.

13. Bi heman awayî, biryarên qedexeya li ber parêzeran ên şeş mehî yê Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê jî bêyî parêzeran hatine birêvebirin. Biryarên qedexekirinê, tevî hemû serlêdanan jî, ji bo hevdîtina bi parêzeran re bê kirin, piştî serlêdanên li Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê bi bersiva *“Biryar hatiye dayîn ku hevdîtina hikumxwaran a bi parêzeran re 6 mehan hatiye qedexekirin”* hatiye hînkirin. Bi vî awayî, di seranserê sala 2022yan de, hatiye tespîtkirin ku Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê du caran (**13ê Nîsana 2022yan û 21ê Cotmeha 2022yan**) biryara qedexekirina serdana parêzeran hatiye dayîn. Îtirazên ji bo van biryaran jî, ji ber ku der barê muwekilan de ku pêwendîya wan a bi derve re bi temamî hatiye qutkirin, hatine redkirin.

Pêvajoyên qedexeyê û cezayên dîsîplînê, ji ber ku hatiye armanckirin bêyî parêzeran bê birêvebirin, heta derbasbûna dema îtirazê hatine sekinandin û piştî pêvajoya teqezkirinê temam bûye hatine tomarkirin. Bi vî awayî muwekilên ku pêwendîya wan bi temamî bi derve re hatiye qutkirin, ji alîkariya parêzeran bêpar hatine hiştin.

14. Daxwazên me yê ji bo wergirtina mînakên biryarên qedexekirina hevdîtina bi parêzeran ên ji aliyê Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê ve ji bo 6 mehan hatine dayîn û çêkirina qeyda UYAPê, çendî me li gor usûlê wekaletname daye jî bi awayekî derqanûnî bi biryarên pêvekî yê dadgeriya înfazê hatine redkirin. Îtirazên me yê ji bo vê jî, yê li Dadgeha Cezayê Giran a Bûrsayê jî bêyî hincet bi tiştên razber û giştî hatine redkirin.

Di pêvajoyên hiqûqî de temsîliyeta me ya ji bo muwekilan û li gor usûlê pêkanîna karê hiqûqî, di seranserê sala 2022yan de bi awayekî dijhiqûqî bi *“biryarên dadgehê”* hatine astengkirin. Bi vî awayî mafê parastinê, darizandina adil, mafê tevî parêzeran xwegihandina dadgehê û serlêdanan yê muwekilan ku maf û azadiyên wan ên bingehîn ên di qanûn, destûra bingehîn û peymanan de hatine pênasekirin hatin bînpêkirin, bi hevkarîya hikûmet-îdare-darazê bi awayekî fiilî bê erk hatine hiştin.

15. Ji bo pêkanînen fiilî yê qedexeya parêzeran ku parçeyêke tecrîdê ne û pêvajoyên hiqûqî yê têkildarî temsîliyete bê erk dike, bi dawî bibin, ji bo temînkirina mafên muwekilan ên di mewzûata neteweyî û navneteweyî de hatine diyarkirin û ji bo astengiya li ber peywira parêzertiyê bi dawî bibe, serlêdanên di sala 2022yan de hatine kirin hemû bê encam hatine hiştin.

16. Ev rewş, ji qanûnan wêdetir, di encama polîtîkaya tecrîda mutleq de pêş ketine ku dewletê bi taybetî ji Nîsana 2015an ve ew ber bi asteke din ve biriyê. Îdareya girtîgehê û mensûbên darazê, bêyî tabî kontrolkirina hiqûqî bin, derî peywirên ku bi qanûnê hatine diyarkirin tevgeriyane. Lewma li Desteya Dadger û Dozgeran û li Serdozgeriya Komarê ya Bûrsayê

giliyê hemû dozger û dadgerên di Pergala Tecrîdê ya Îmraliyê de derî hiqûq û qanûnê tevgeriyane, hatiye kirin. Lê di sala 2022yan de di vî warî de jî tu bersiv û geşedaneke erênî rû nedaye û berevajî vê, giliyeke me jî esas nehatiye girtin û hatine redkirin. Ev rewş jî bûye delîleke din ku li girtîgeha giravê ya Îmraliyê hiqûqeke taybet û polîtîkaya tecrîda mutleq a derqanûnî bi hevkarîya hikûmet-îdare-darazê tê birêvebirin û pêkanîn.

IV. LI DIJÎ TECRÎDÊ Û XEBERNEGIRTINÊ SERLÊDAN Û GEŞEDANÊN DIN:

17. Di 24ê Kanûna 2021ê de serî li Dadgeha Destûra Bingehîn hat dayîn. Di serlêdanê de hat xwestin ku dawî li “**incommunicado**”yê (desteserkirin) bê ku qedexeya îşkenceyê bi awayekî herî giran bînpê dike û demildest hevdîtin bi muwekîlan re bê kirin. Dadgeha Destûra Bingehîn (AYM), bi biryara xwe ya navberê ya **12ê Çileyê 2022yan**, got jiholêrakirina hemû mafên muwekîlan û bi derve re qutkirina pêwendîya wan ne derî hiqûqê ye û daxwaza ji bo tevdirgirtinê red kir. Biryara navberê, çendî lezgîn bû û ji bo tevdirgirtinê bû jî, di **31ê Çileyê 2022yan** de hat teblîxkirin.

Dadgeha Destûra Bingehîn, di serê sala 2022yan de biryareke bêhiqûqî da û paşê bêpwendî û nexebergirtina mutleq, bi biryarên îdareya girtîgehê û dadgeha herêmî bênavber hatin domandin.

18. Li dijî nexebergirtina ku bi biryarên qedexê û sîno-darkirinê yên ne hiqûqî û qanûnî hat çêkirin, li Tirkîyeyê 775 parêzerên li ser 29 baroyan qeydkirî, di navbera 10ê Hezîran-17ê Hezîrana 2022yan de serî li Serdozgeriya Bûrsayê û Îdareya Girtîgeha Îmraliyê dan û xwestin demildest hevdîtin pêk bînin. Serokên baroyan jî di nav de, ev serlêdanên bi sedan parêzeran bi tu awayî nehat bersivandin.

19. Di seranserê salê de der barê tenduristiya muwekîlan, şert û mercên girtîgehê, rewşa hiqûqî û rewşên din de tu xeber nehatin wergirtin. Ji ber ku hemû rêyên hiqûqa navxweyî bêerk in, bêpewendî û xeberegirtina mutleq bû cihê zêdebûna fikaran. Lewma di 29ê Tîrmeha 2022yan de ji bo tevdirgirtinê serî li Komîteya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî hatiye girtin.

20. Welatên Ewropayê jî di nav de ji 22 welatên cuda 350 parêzer di 14ê Îlona 2022yan de, ji Rojhilata Navîn 756 parêzer jî di 19ê Îlona 2022yan de serî li Wezareta Dadê dan ku hevdîtinê bi muwekîlên di Girtîgeha Giravê ya Îmraliyê de bikin û dawî li bînpêkirina heyî bê. Lê belê ev daxwaz jî bê bersiv hatin hiştin.

21. Di 28ê Mijdara 2022yan de ji bo dawî li nexebergirtinê bê, bi awayekî fîzîkî pêwendî bi muwekîlan re bê danîn û şert û mercên îzolasyonê bînin başkirin, doza randevûyê li Wezareta Dadê hat kirin, lê ev daxwaz jî heya niha nehatiye bersivandin.

22. Ji dêvla ku pêşniyazên CPT’yê yên ji bo bidawîkirina bêhiqûqîtiyên li Girtîgeha Giravê ya Îmraliyê bînin pêkanîn, ev di seranserê sala 2022yan de bi biryarên dijhiqûqî û pêkanînen sîstematîk hatin pûçkirin.

23. CPT, di rapora xwe ya 2013an û yên piştî wê de, tespît kiribû ku astengkirina hevdîtinê bi parêzeran re biryareke polîtîk e û li dijî mewzûata navxweyî ye. (Rapora 2013an a CPTyê û raporên wê yên piştî 2013an). Her wiha tespîta ku cezayên dîsîplîne yên ku hevdîtinên bi malbatê re qedexê dike xwe dispêrin sedemên xapîner, di paragrafa 49an a rapora 2019an ya CPTyê de heye. Girêdayî van tespîtan, li gel pêşniyazên ku divê hevdîtinên bi malbatê û parêzeran re bi awayekî çalak bînin kirin jî, tu guherîn di helwesta hikûmet, îdare, dozgerî,

Dadgeriya İnfazê, Dadgeha Cezayê Giran û Dadgeha Destûra Bingehîn de çênebûn.

24. Di sala 2022yan de 3 caran serî li Komîteya Pêşgirtina Li Îşkenceyê ya Ewropayê (CPT) hatiye danîn ku CPT, di nava sînoren Konseya Ewropayê de berpîrsê jiholêrakirina îşkence, muameleyên dij miorvî û xirab û tespîtîkirina wan e. Di van serlêdanan de, bi awayekî berfireh hatiye diyarkirin ku şert û mercên ragirtina li Îmralityê muameleya xirab derbas kiriye, pêkanînen rejîma înfazê ya muebeda girankirî, qedexeya îşkenceyê û qedexeya cihêkariyê bi awayekî sistematîk dewam kirine û ji 25ê Adara 2021ê ve jî tu xeber ji muwekilan nehatiye girtin û awayê desteserkirinê “**incommunicado**” bi awayekî girankirî dewam kiriye. Ji ber van sedeman, hatiye xwestin ku CPT bi awayekî de facto serdana girtîgeha giravê ya Îmralityê bike û li wir hin lêkolînan bike û hatiye xwestin ku ji bo başkirina şert û mercên ragirtinê û bidawîkirina qedexeyên serdanê tevdir bên girtin û prosedur bên pêkanîn.

25. CPTyê daxuyandibû ku di 20-29ê Îlona 2022yan de serdana Girtîgeha Giravê ya Îmralityê kiriye, lê têkildarî rewşa muwekilan de tu daxuyanî neda. Têkildarî mijarê rûbirû hevdiîn bi CPTyê re hatiye kirin, lê pîrsên der barê tenduristî û şert û mercên muwekilan de bê bersiv hatine hiştin û helwesta agahînedanê hatiye nîşandan.

Ji ber van sedeman, me di 31ê Kanûna 2022yan de serî li CPTyê da û ji Komîteyê daxwaz kir ku demildest rapora têkildarî serdana dawî de bi raya giştî re parve bike. Ev daxwaz, xwe spartiya xala 10/2yan a Peymana Pêşgirtina Îşkenceyê. Li gor vê; “*Ger Aliyê têkildar tevkeriyê neke an jî gava di çarçoveya pêşniyazên Komîteyê de başkirina rewşê bê redkirin, Komîte ji sê payên endamên xwe bi du payan dikare têkildarî mijarê daxuyaniyê bide.*”

Di pratîkên berê yê CPT’yê de tê dîtin ku gelek mînakên ji bo “daxuyaniya ji bo raya giştî” hene. Lê CPT belavkirina çavdêriyên xwe bi pesendkirina hikûmetê ve girêdaye.

26. Beriya serdana dawî ya CPTyê (20-29ê Îlona 2022yan), di **9ê Îlona 2022yan** de der barê muwekilan de bi hinceta cezayê dîsîplînê 3 mehan qedexekirina hevdiîna bi malbatê re hat danîn. Piştî serdanê, di **21ê Cotmeha 2022yan** de, ji bo şeş mehan biryara qedexekirina hevdiîna bi parêzeran re hat dayîn. Gava ev tevî nepêkanînan tespît û pêşniyazên di raporên berê yê CPTyê de bê nirxandin, kifş dibe ku rapor û çavdêriyên CPT’yê li bara mekanîzmayên neteweyî esas nayên girtin.

27. Herî dawî Abît Aktaş, bavê muwekil Veysî Aktaş, di 20ê Kanûna 2022yan de jiyana xwe ji dest da. Ji bo Veysî Aktaş tevî merasîma definkirinê û şîne bibe, di heman rojê de serî li Serdozgeriya Komarê ya Bûrsayê hat dayîn. Xala 66/3yan a qanûna bi hejmara 5275an bi vî awayî ye; “*Di dema mirina xizmên nêz, nexweşînen giran, pandemî yan jî karesatên xwezayî de hikumxwar demildest divê sûdê ji amûrên wekî telefon û faksê sûdê bigirin.*” Li gor xala 94an a heman qanûnê, hikumxwar dikarin tevî merasîma cenaze ya xizmên xwe yê nêz bibin. Lê belê hem nehatiye hiştin muwekil Aktaş tevî merasîma definkirina cenaze û şîne bibe, hem jî nehatiye hiştin bi rêya telefon an jî faksê pêwendiyê bi malbata xwe re deyne. Em nizanin bê ka haya wî ji mirina bavê wî heye yan na. Di rewşeke wisa mirovî de jî bêpewendiya mutleq a “incommunicado”yê nehat sekinandin û bînavber hat domandin.

28. Gava tevî daneyên li jorê bê nirxandin, **sala 2022yan, bûye sala bîpwendî û xebernegirtina mutleq.**

V. BINPÊKIRIN

a) Binpêkirina Qedexeya Îşkence û Miameleya Dermirovî

“Îşkence yan jî miameleyeke dermirovî yan jî biçûkker bi tu awayî nikare li tu kesî were kirin an jî cezayekî dermirovî yan jî biçûkker bi tu awayî nikare li tu kesî were birîn.”

29. Armanca bingehîn a qedexekirina îşkence û miameleya dermirovî ew e ku rûmeta mirovan were parastin û **di bin her şert û mercî de yekpareyiya laşî û derûnî ya mirovan were temînkirin.** Qedexeya îşkenceyê bi taybetî di Deklerasyona Ewropî ya Mafên Mirovan de û wekî din jî, di Peymana Nawneteweyî ya Mafên Medenî û Siyasî û gelek belgeyên din de hatiye pênasekirin. Xala 3yemîn a Peymana Ewropî ya Mafên Mirovan (ECHR) qedexeya li ser îşkenceyê, miameleya dermirovî, cezaya dermirovî, miameleya biçûkker û cezaya biçûkker jî di nav xwe de dihewîne. Çawa ku ji hêla Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) ve jî gelek caran tê dubarekirin, **xala 3yemîn yek ji nirxên herî bingehîn ên civakên demokratîk** li xwe digire. Ji ber vê çendê, dewletên endam divê rêzê li vê hukmê bigirin û **hemû bergiriyên pêwîst bigirin da ku** ev hukm di nav sînorên erka wan a darazî de **bi awayekî çalak bê cîbicîkin.**

30. Her wekî ku di Xala 1emîn a Peymana Ewropî ya Mafên Mirovan de jî hatiye îfadekirin, yek ji krîterên mafên mirovan ên gerdûnî ew e ku ji bilî bêparhiştina ji azadiya xwe ya bi biryareke dadgehan a li gorî prensîbên hiqûqê divê her girtî xwedî hemû mafên xwe bibe. Hepsbûn divê li gorî qaîdeyên ku rûmeta mirovan diparêzin û bi awayekî ku dernakevin derveyê şert û mercên kêmtirîn û asayî yên girtîbûnê were birêvebirin. **Lê belê Birêz Ocalan û miwekkîlên din ev bi salan e li şert û mercên wekî tecrîda qethî, qutkirina qethî ya her cure ragihandin û pêwendiyê û bêagahîhiştinê rast tên ku ji van şert û mercên asayî yên girtîbûnê gelekî girantir û wêdetir in. Şert û mercên heyî yên tecrîda qethî û qutkirina her cure ragihandin û pêwendiyê qedexeya îşkenceyê bin pê dikin û dihêlin ku bi vî awayî îşkence û ceza û miameleya dermirovî li miwekkîlan werin kirin.**

31. Tevî vê yekê, rejîma girankirî ya înfazê ya li Girava Îmraliyê bi rêya “qanûn û rêzîknameyan” tê meşandin bi xwe jî qedexeya miameleya dermirovî bin pê dike. Wekî vê yekê piştrast bike, biryara DMMEyê a 18ê Adara 2014an a bi navê **Ocalan No:2** jî teqez dike ku rejîma girankirî ya înfazê di nav xwe de şert û mercên wisa dihewîne ku Xala 3yemîn a Peymana Ewropî ya Mafên Mirovan bin pê dikin. Di vê biryara navborî de tê destnîşankirin ku ev binpêkirin ne di kêliya biryardayîne de, lê belê ji dema derxistina qanûn û rêzîknameyên têkildar û pê ve derketiye holê. **Bi gotineke din, bi biryareke navneteweyî hatiye pesendkirin ku rejîma girankirî ya înfazê ya li Îmraliyê ji destpêkê ve rejîmeke îşkenceyê ye.**

b) Binpêkirina Mafê Pêwendiyê

“Mafê her kesî heye ku rêzgirtina li pêwendî û pevrenivîsên şexsî daxwaz bike.”

32. Mafê ku mirov daxwaza rêzgirtina li pêwendiyên xwe yên wekî jiyana taybet û malbatî bike di xala 25an a Qanûna bi hejmara 5275an, Xala 25an a Destûra Bingehîn a Tirkîyeyê, Xala 8emîn a Peymana Ewropî ya Mafên Mirovan û gelek peymanên navdewletî de hatiye misogerkirin. Mafê pêwendiyê mafê her kesî yê ku bi kesên din re nêzî hev bibe da ku bi kesên din û dinyaya derve re têkilîyan dayne û têkilîyên heyî bi pêş bixe ango mafê her kesî yê “jiyana sosyal a taybet” jî di nav xwe de dihewîne. Yekpareyiya kesên a fîzîkî, derûnî yan jî manewî, mahremiyeta kesên û nasname û xweseriya kesên jî dîsa di bin banê vî mafî de cih digirin. Temînata ku bi rêya xala 8emîn a Peymana Ewropî ya Mafên Mirovan hatiye dayîn dihêle ku berî her tiştî kesayeta her mirovî bêyî tu destwerdanê di nav têkilîyên wan kesên ên

bi kesên din re geşe bide û bi pêş bikeve. Alîkarî û piştgiriya ku bi destê kesên li girtîgehê peywirdar in ji bo girtiyan werin dayîn ku girtî bikarin bi malbat û parêzerên xwe re hevdîtînen xwe bidomînin qismekî girîng ê mafê girtiyan ê rêzgirtina li malbatê û mafê wan ê pêwendiyê ye. Tevî vê yekê jî, **miwekkîlên ku di sala 2022yan de ji mafên xwe yên serdanê bê par hatibûn hîştin, mafên wan ên ku bi rêya telefon, name û faksê têkiliyê daynin jî bi domdarî hatine astengkirin.**

c) Binpêkirina Mafê Darizandina Adilane

33. Mafê parastinê yê ku di çarçoveya mafê darizandina adilane de hatiye pênasekirin bi tevahiya maweya girtîbûna miwekkîlan her derbasdar û berdewam e. Ji ber ku mafê azadiya fîzîkî ne tê de ji hêla mafên din ve çawa ku kesên din kirdeyên xwedî maf in girtî jî wisa kirdeyên xwedî maf in. Di vê behsê de li gorî Xala 6/1em a Peymana Ewropî ya Mafên Mirovan mafê hevdîtina bi parêzeran re bi gelek rahênanên hiqûqî, civakî û jiyanî re têkildar e.

34. Birêz Ocalan û miwekkîlên din, birek dozên wan ên ku li ba Dadgeha Destûra Bingehîn a Tirkiyeyê û DMMEyê in hêsta jî berdewam in. Dîsa, wekî ku di bin sernavên têkildar de hatiye vegotin sê mehan carekê bi awayekî domdar darizandinên ji bo cezayên dîsîplînê tînen birêvebirin û di encama vê pêvajoyê de bêtir îstîsna cezayên dîsîplînê li wan tînen birin. Li gel vê yekê, bi armanca ku binpêkirinên ji ber şert û mercên girtîbûnê û rejîma girankirî ya înfazê ji holê bên rakirin û seba dozên ku dê bên vekirin mafê wan heye ku alîkariya parêzeran bigirin, li şewirmendiya hiqûqî bigerin û li ser parêzerekî/ê serî li rê û derfetên karîger ên hiqûqê bidin. Lê belê, li Îmraliyê çawa ku serdanên parêzeran tînen astengkirin wisa jî hewldanên hiqûqî yên ku mebesta wan jiholêrakirin û çareserkirina binpêkirinên mafan ên ku bi awayekî pergalkirî pêk tînen bi awayekî derhiqûqî tînen astengkirin.

35. Bi gotineke din, miwekkîlên ku ji maf û azadiyên xwe yên bingehîn ên ku di çarçoveya qanûn, destûra bingehîn û peymanan de hatine diyarkirin bê par tînen hîştin, rê li ber cîbicîkirina peywir, erk û berpirsiyariyên parêzerên wan jî tê girtin û tevahiya mafên wan ên wekî mafê parastinê, mafê darizandina adilane û mafê xwegihandin û serlêdana dadgehan bi hevkarîya merciyên îdarî û edlî bi yek carî tînen betalkirin. Di vê çarçoveyê de ne di peymanên navneteweyî de ku Tirkiyeyê pesend kirine û aliyekî wan e ne jî di qanûn û rêzîknameyên Tirkiyeyê bi xwe de tu gotineke ku ev şert û mercên bêpeywendîhîştina qethî lê werin sipartin nîn e.

d) Nebûna Rê û Derfetên Karîger ên Serlêdanê

36. Li dijî rewşa *incommunicado* ku hemû mafên miwekkîlan ên ku di peymanên navneteweyî de hatine misogerkirin bi yek carî tune dihesibîne çî mekanîzmeyeke karîger nîn e ku were xebitandin. Biryarên ku ji Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê, Dadgeha Cezayê Giran a Bûrsayê û Dadgeha Destûra Bingehîn derdikevin hemû neyînî bi encam dibin. Hemû serlêdanên li van merciyên tînen kirin paşve tînen zivirandin. Encamên îstatîstîkî yên ku di navbera salên 2005 û 2022yan de hatine bidestxistin nîşan didin ku merciyên darizandinê ji bo serlêdanên ku mijara wan Girtîgeha Îmraliyê ye rêyeke hiqûqî ya xurt û kêrhatî nîn e.

37. Ji sala 2005an heta nivê sala 2022yan Ocalan û miwekkîlên din ên ku li Girtîgeha Îmraliyê girtî ne serlêdanên ku li ser navê wan li Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê hatine kirin hejmara wan

(ên ku pêkan bûye werin tespîtîkirin) 164 e. Bi tenê serlêdanek (ku ew jî ya Weysî Aktaş e) hatiye pejirandin. Ji sala 2005an û pê ve, serlêdanên ku li ser navê Ocalan hatine kirin ji nav wan yên ku pê encamek hatiye bidestxistin an jî yên ku hatine qebûlkirin an jî qismen hatine qebûlkirin jî hejmara wan 0 e. Ji roja ku herî dawî xeber jê hatiye standin (25ê Adara 2021an) û pê ve hemû serlêdanên ku li Dadgeriya Înfazê hatine kirin paşve hatine zivirandin û ev yek jî ji hêla Dadhega Cezayê Giran ve ku merciya îtirazkirinê ye hatiye pejirandin. Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê û Dadgehên Cezayê Giran ji aliyê biryarên li ser bêpêwendîhiştina qethî ve bûne navendên biryarên kêfî yên nehiqûqî. Vê rewşê hem ji aliyekî ve bi hevkarîya erkên desthilatî, îdarî û darazî tevliheviyeke pergalkirî derxistiye holê hem jî ji aliyekî din ve îmkana ku miwekkîl bi parêzeran re hevdîtinan pêk binin an jî bikarin ji hêla parêzerekê ve bînen temsîlkirin ji holê rakiriye. Di encamê de, ji bo miwekkîlan ji hêla hiqûqê ve girêhişkeke ku nayê jihevkerin derketiye holê. Serlêdanên ku îsal ji bo nirxandina Dadgeha Destûra Bingehîn hatine şandin jî ji wan hêşta jî tu bersiveke erênî nehatiye bidestxistin. Jixwe ji sala 2005an û pê ve biryarên li ser gelek serlêdanên takekesî jî nehatine biencamkirin û biryardayîn tê derengxistin û bi vî awayî ji karîgerbûnê tîr dîrxistin. Sêrlêdana takekesî ya li Dadgeha Destûra Bingehîn ji bo miwekkîlên ku tîkiliyên wan ên bi dinyaya derve re hatine qûtîkirin wek rêyekê ne karîger e ku bikare şert û mercên tecrîda qethî ku ew tê de dijîn ji holê rake.

38. Di behsa serlêdanên li ser bînpêkirinên giran ên mafên mirovan ên ku li Îmraliyê tîr domandin de, serlêdanên ku di sala 2022yan li asteke lokal hatine kirin ne tê de, serlêdanên takekesî ku di asta dadgehên bilind de hatine kirin sê ji wan li Dadgeha Destûra Bingehîn a Tirkiyeyê û yek ji wan jî li Komîteya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî hatiye kirin. Dîsa, gelek serlêdan li DMMEyê hatine kirin. Di gel van serlêdanan, di halê hazir de li ser navê her 4 miwekkîlên me serhev **li ba Dadgeha Destûra Bingehîn 82 serlêdanên takekesî, li ba Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê 12 serlêdan** û wekî din jî **li ba Komîteya Mafên Mirovan a NY serlêdanek** derdestkirî ye.

e) Rejîma Girankirî ya Înfaza Muebetê

39. Rejîma girankirî ya cezayê muebbetê di xala 25 û 107an a qanûna bi hejmara 5275an tê pênasekirin. Di vê qanûnê de tê diyarkirin ku cezayê girtîgehê wê di tevahiya jiyana kesekî de bidome û bi tu awayî navber neyê dayîn. Her wiha li gorî van qanûn û rêzîknameyan, mirov dikare di dema girtîbûnê de di asteke herî kêr de ji maf û azadiyên bingehîn sûtê wergire. DMMEyê bi biryara xwe ya bi navê *Ocalan No:2* a 18ê Adara 2014an biryar da ku ev qanûn û rêzîkname li dijî qedexeya miameleya dermîrovî ne û diyar kir ku divê ev qanûn û rêzîkname li gorî hiqûqê werin guhertin.

40. Ji bo bi cihanîna biryara DMMEyê ya bi navê *Ocalan No:2*, di 1ê Cotmeha 2021an de serî li Dadgeriya Înfazê yê Bûrsayê hat dayîn. Ji bo betalkirina xala 107/16 a qanûna bi hejmara 5275an û xala 17/4 a qanûna bi hejmara 3713an ku ji bo serbestberdana bi şert astengî dibûn asteng bi sedema ku ne li gorî Destûra Bingehîn in daxwaza serlêdana li Dadgeha Destûra Bingehîn hat kirin. Her wiha bi biryara DMMEyê re hat xwestin ku Birêz Ocalan li hemberî qedexeya îşkenceyê 23 salan di nava şert û mercên giran de hatiye hiştin û bêyî ku di warê civakî, siyasî û hiqûqî de ev pêvajoyê bê dirêjkirin divê ew bê serbestberdan û bigihîje azadiya xwe. Lê Dadgeriya Înfazê bi paşguhkirina tespîtên îxlalê yê DMMEyê û nirxandinên ku di biryarê de cih digirin, serlêdan red kir. Serlêdana li dijî vê biryarê jî ji aliyê Dadgeha Cezayê Giran a Bûrsayê ve hate redkirin. Li ser vê yekê di 3ê Berfanbara 2021an de bi heman daxwazan serî li Dadgeha Destûra Bingehîn hat dayîn.

41. DMMEyê cezaya hepsê ya mirinê, wek îhlala li dijî îşkenceyê dîtîye û piştî biryara bi navê *Ocalan No: 2yê, Kaytan v. Türkiye, Gurban/Türkiye û Boltan/Türkiye* jî di serlêdanên xwe de biryarên îxlalkirinê derxistine pêş.

42. Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê 4 dosya hildane pêvajoya şopandin û çavdêriyê, lê belê tevî ku Türkiye li gorî vê biryarê tevnegeriyaye jî Komîteyê 7 salan tu behsa vê yekê nekiriye. Piştî 5 teblîgatên (di 2016, 2017, 2018, 2021 û 2022an de) ku ji hêla Ofîsa me ve bi sedema ku biryarên DMMEyê yên têkildar nehatine bicihanîn dem bi dem hatine şandin û piştî ku teblîgatên ji hêla Komeleya Hiqûqnasên Azadîxwaz, Komeleya Mafên Mirovan, Weqfa Mafên Mirovan a Tirkîyeyê û Weqfa Lêkolînên Hiqûqî û Civakî ve di sala 2021an de hatine kirin, Komîteyê biryar daye ku her çar biryarên xwe bixe rojeva xwe.

43. Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê ku xwedî wê berpirsariyê ye ku bihêle ku binpêkirinên di biryarnamayan de ji holê bên rakirin, di biryarên xwe yên navberê yên civîna 30ê Mijdar-2yê Kanûna 2021an de destnîşan kiriye ku binpêkirina heyî ya qedexeya îşkenceyê dewam dike, Tirkîyeyê agahiyên berdest ên li ser mijarê parve nekirine û pêdiviyên biryarê bi cih neanine. Bi van tespîtan re hat ragihandin ku tedbîrên hiqûqî û têrker ên din ên ji bo mekanîzmaya lêpîrsînê ya ji bo lêkolînkirina cezayê girankirî yê mubbetê, piştî demeke herî kêr divê bêyî derengmayînê bê meşandin û hat xwestin ku Türkiye heta Îlona 2022yan der barê gavên divê werin avêtin de Komîteyê agahdar bike.

44. Li aliyê din, Tirkîyeyê heta niha xwe ji parvekirina agahî û daneyên îstatîstîkî yên ku di biryarên navberê de hatine xwestin, dûr xistiye. Piştî bidawîbûna serdemê, plana çalakîyê ya rojanekirî ya 13ê Cotmeha 2022yan ji aliyê hikûmetê ve hate pêşkêşkirin. Di vê plana çalakîyê de rejîma cezayê mubbetê ya girankirî û heta mirinê hatiye parastin û rewanişandan û derketiye holê ku tu niyet û planeke guhertina qanûn û rêzîknameyên têkildar nîn e. Bi gotineke din, Tirkîyeyê ragihandiye ku ew ê li gorî biryarên DMMEyê tev negere. Lê belê ji ber ku Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê lez neda pêvajoya şopandinê ya der heqê Tirkîyeyê de û di civîna dawî ya sala 2022yan de tu biryar nehatin girtin û di salnameya civîna 2023yan de jî cih nedaye vê mijarê, ev yek der barê çavdêriya Komîteyê de gumanan derdixe holê.

VI. TESPÎT Û ENCAM

1- Saziya Înfaza Cezayî ya Bi Ewlekariya Zêdekirî ya Girtî ya Tîpa Fyê ku li ser Girava Îmrallyê ya li Behra Marmarayê û di nav sînorên desthilatdariya Tirkîyeyê de ye her çend ku wekî ku bi Wezaretê Dadê ve girêdayî ye xuya bike jî di rastiya xwe de ji hêla mekanîzmaya qeyranê ya derasayî ve tê birêvebirin. Biryarên sîyasî yên vê mekanîzmayê bi taybetî ji bo Îmrallyê heta niha diyarker bûne û hê jî diyarker in. Hemû pratîkên têkildarî hiqûqê û destûra bingehîn û pratîkên deryasayî yên ku di çarçoveya pergala taybet a ji bo Îmrallyê avakirî de tên kirin bi rêya gotinên razber ên wekî “rewşa krîzê”, “kesê metirsîdar”, “teror”, “ewlekariya zêdekirî” û “rewşa awarte” ku bêyî navberên dubarekirin xwestine werin rewakirin. Bi van peyvên giştî û razber hemû maf û azadiyên bingehîn ên miwekkîlan ku di peymanên navneteweyî, destûra bingehîn û qanûnên Tirkîyeyê de hatine pênasekirin bi awayekî pergalkirî hatine binpêkirin, tunehesibandin û bi polîtîkaya tecrîda qethî ya piştî 2015an bi tevahî ji holê hatiye rakirin.

2- Heta pêvajoya Rewşa Awarte ya ku di sala 2016an de hate ragihandin, wexta hevdîtîna

bi malbat û parêzeran re dê bihatina astengkirin û sînorkirin biryarên siyasî yên wekî “neguncanbûna şertên hewayî” û “xerabbûna keştiyê” ku bawerî pê nedihatîn wek hincet dihatin pêşkêşkirin. Ji 20ê Tîrmeha 2016an û pê ve ku Rewşa Awarte hatibû ragihandin, Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê ya lem biryarek girt ku ji ber wê miwekkîl bi hinceta “rewşa awarte” ji hemû mafên xwe yên mirovî yên bingehîn ên wekî serdan, telefon, pêwendî hwd. bo demeke nediyarkirî hatin bêparhîştin. Bi vî rengî, heyama hincetên wekî “neguncanbûna şertên hewayî” û “xerabbûna keştiyê” hate girtin ku bi raporên CPTyê jî hatibû gotin ku bawerî bi wan nayê; di dewsa wê de heyama “biryarên dadgehan” dest pê kir ku ne li gorî tu bingehên hiqûqî, qanûnî û maddî ne û li ser çekirina hincetên nû radiwestin ku polîtîkaya tecrîda qethî rewa nîşan bidin.

3- Çendî ku Rewşa Awarte di sala 2018an de ji meriyetê hatibe derxistin jî, qedexa berdewam bûne li ser mafên miwekkîlan ên ku di Destûra Bingehîn, peymanên navneteweyî û qanûnan de hatine misogerkirin wekî mafên hevdîtina bi parêzerên xwe re, hevdîtina bi malbatê re, ragihandina bi rêya telefonê û pêwendiya bi dinyaya derve re bi rêya name, faks û amûrên din ên ragihandinê. Bi cezayên dîsîplîne yên sê mehan carekê dubarebûyî mafên wan ên serdana malbatê û bi biryarên dadgehan ên şeş mehan carekê nûkirî mafên wan ên hevdîtina bi parêzeran re û bi rêya telefonê pêwendîdanîne bi awayekî periyodîk û pergalkirî hatine bînpêkirin. Di sala 2022yan de li ser hev û bi hev re cîbicîkirina van biryarên çekirî û bê bingeh ku ragihandin û pêwendiya herî kêr û bingehîn jî ji holê rakirine bûye delîl û belgeyên ragirtina di bin şert û mercên *incommunicadoyê*. Bi vî halî, sala 2022yan jî wekî heyama beriya xwe bûye saleke ku tê de ji hêla hiqûqî ve ewlehî û pêşiyaxwedîtin nebûye û her wiha mekanîzmayên çavdêriya hiqûqî jî bê kêr bûne û tecrîda qethî hatiye girankirin.

4- Ji 25ê Adara 2021an heta roja îro jî ji miwekkîlan tu tu awayî tu agahî nehatine hinbûn û hemû têkilivên wan ên bi dinyaya derve re hatine qûtkirin. Sala 2022yan bi vî rengî dest pê kiriyê û hemû serlêdanên malbat û parêzerên miwekkîlan ên di tevahiya salê de bê encam hatine hîştin û ji bo serdanan bi tu awayî destûr nehatiye dayîn. Ji ber ku tevî hemû serlêdanan jî ev halê *incommunicadoyê* hatiye berdewamkirin **sala 2022yan bûye saleke ku tê de tu pêwendî û ragihandin pêk nehatine û tu agahî ji miwekkîlan nehatine girtin.**

5- Bi biryara DMMEyê ya 18ê Adara 2014an a bi navê Ocalan: 2yê re hatiye îspatkirin ku rejîma girankirî ya cezayê hepsê ya mûebbetê ji destpêkê ve rejîmeke îşkenceyê ye. Di heman biryarê de hatiye diyarkirin ku pratîkên tecrîdê qedexeya îşkenceyê bin pê dikin û divê ji holê werin rakirin. Di gel vê yekê, şert û mercên tecrîdê hatine girantirandin û ji sala 2015an û şûn de asta wan gihîştîye tecrîda qethî. Li ser vê esasê, miwekkîlên me Birêz Abdullah Ocalan ev 24 sal e û Birêz Konar, Birêz Aktaş û Birêz Yildirim jî ji Adara 2015an û pê ve ku li vê pergalê hatibûn zêdekirin jî ev 8 sal e duçarî pratîkên dermîrovî yên herî giran tî. Di tevahiya sala 2022yan de qedexeya îşkenceyê ya ku di xala 3yem a Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê de hatiye pênasekirin, mafê darizandina adilane ku di xala 6an de hatiye pênasekirin û mafê rêzgirtina li jiyana malbatî û jiyana taybet û mafê pêwendiyê ku di xala 8an de hatine pênasekirin û mafê xwegihandina rêyeke karîger a hiqûqî ya serlêdanê ku di xala 13an de û qedexeya cudakariyê ku di xala 14an de hatine pênasekirin û xala 18an ku bertengkirin û sînorkirina azadiyan a bi awayekî kêfî û bê armanc qedexa dike bi hevkarîya erkên desthilatî, îdarî û darazî bi awayekî pergalkirî û bê navber bi tevahî hatine bînpêkirin.

6- Di serî de Birêz Ocalan û pê re jî miwekkîlên din ên ku di Girtîgeha li Girava Îmraliyê de tîn ragirtin rejîma cezakirinê ya ku li ser wan tê ferzkirin bûye polîtîkayêke bêhiqûqiyê ku li seranserê welêt şax daye. Ne zehmet e ku bête çavdêrikirin ku avakirina rejîma jiyanêke bê hiqûq û ne demokratîk û Pergala Tecrîdê ya Îmraliyê ku tê de Destûra Bingehîn, Peymana Ewropî ya Mafên Mirovan û hemû peymanên din ên hiqûqî tîn tunchesibandin çawa li hev tîn û miqabilî hev in. Demên ku derfet hatibûn dayîn ku deriyên Îmraliyê werin vekirin û Birêz Ocalan bikaribe rola xwe ya di çareserî û aştiyêke demokratîk de bi cih bîne û bi civakê re di nav diyalogê de bibe, ji bo gelên Tirkiyeyê bûne demên hevîdar, demên bêhvedanê û demên ku li welêt geşedanên demokratîk û pêşketinên aborî pêk hatine û aşî û aramî li civakê serwer bûne. Li tevahiya welêt ezmûnên heta niha vê yekê baş nîşan dane ku di helwestên têkildarî pirsgerêka kurd de her kengî ku polîtîkayên ewlekariyê derketine pêş û zal bûne tecrîda li Girtîgeha Girava Îmraliyê jî bi vê yekê re hatiye girantirkirin. Bi taybetî, ev heşt salên dawî ji vê hêlê ve bûne heyama herî giran. Di navbera rewşa bîpêwendîhiştina qethî ya li Îmraliyê û astengkirina hemû têkilî û hevîtinan û rewşa qeyranê ya piralî û giranbûyî ya li gelek astên wekî civakî, çandî, sîyasî, hiqûqî, aborî û hwd. de têkiliyêke diyalektîk heye.

7- Tecrîda bîst û çar salan, tecrîda qethî ya piştî 2015an û pratîkên bêtêkilî û bîpêwendîtiya qethî ya ku piştî 2021an dest pê kirine û di sala 2022yan de jî hatine girantirkirin tîn wateya di çareserîya pirsgerêka kurd de betalkirina hiqûqê û tunekirina rêya siyaseta demokratîk û esasgirtina rêya zordariyê, şer û tundiyê. Ev rê li ser wan polîtîkayan radiweste ku avakarên wan aliyên rantxwaz ên ku li dijî bikaranîna rêya diyalog û guftûgoyê ne û xwe bi siyaseta bêçareseriyê, dijminatîyê û rantgiriya mezînan dikin. Û encamên neyînî yên van polîtîkayan welêt anîne ber deverêyêke wisa ku tê de gelek qeyranên piralî tîn jîyîn. Ji bo ku ev halê qeyranê yê piralî were guhertin û li pey were hiştin tekane rê ew e ku di pirsgerêka kurd de pêvajoyêke çareserîya demokratîk ji nû ve were destpêkirin, pergala tecrîdê ya Îmraliyê were betalkirin û Birêz Ocalan xwedî derfetên pêwîst bibe ku bikaribe rola xwe ya çareserîxwaz û aşîxwaz bi cih bîne.

8- Di tevahiya pêvajoya Îmraliyê de ku 24 salên xwe temam kiriye, Birêz Ocalan her tim ev yek anîye ziman ku di pirsgerêka kurd de ew çareseriyêke demokratîk û aştiyane a ku di Destûra Bingehîn de hatiye misogerkirin dixwaze û pozîsyona Îmraliyê bivî rengî destnîşan kiriye. Li ser vê esasê, di tevahiya pêvajoya Îmraliyê de ku dikeve sala 25an her dema ku derfet hatiye dayîn wî li dijî hêzên ku diyalog û aştiyê naxwazin siyaseteke aştiyê û jiyane saz kiriye û bi vî rengî jî rola xwe ya dirokî bi cih anîye. Her dawî di guftûgo û hevîtinên di sala 2019an de ku her çend bi awayekî sînorkirî bibe jî wî karibû nêrinên xwe parve bike, prensîp û pêşniyarên wî yên çareseriyê yên kêrhatî û çêker careke din vê yekê îsbat kirin.

9- Wek encam, polîtîkaya tecrîd û îşkenceyê ya li girtîgeha Îmraliyê divê were terikandin, prensîbên gerdûnî yên hiqûqê divê werin pejirandin û bicihanîn, astengên li ber serdanên malbat û parêzeran û li ser wan agahîgirtinê divê werin rakirin û şert û mercên tenduristî, azadî û ewlehiya wan divê bîne misogerkirin.